li zanîngeha Helebê

***- Li** 14 î Nîsana 2006an , rêxistina P.Y.D.Ks li zanîngeha Helebê, seyranek ji xwendekarên Kurd re li zanîngehê li darxist . Seyran bi hevpişkiya dora 2000 xort û keçên Kurd yên xwendekar û alîkariya gelek hunermendên hêja mîna Mehmûd Ezîz Şakêr, Osman Can, zekerî, Teyar, Newroz,

Havîn û koma zanîn…H.W.D, tevlêbûna xwendekarên Efrînê û beşdariya hin hevalên rêvebir ya partiya YEKÎTÎ li darket . Seyrana xwendekarî, li navça Efrînê, di hembêza ziravka xweşik û delal de, li nav dar û berên wê yên bi hemerengan xemlandî , bi silavnamake kurt ji bal P.Y.D.Ks destpêkir . Pişti re pirogram bi stranên folklorî jaliyê stiranbêjan ve, awazên xweşik û delal, çepik û lîliyan, reqis, sema û dîlanên curbecur cihê – cihê, bi kêf û xweşî hate domandin . Mirov dikare bibêje ku, seyran ta dawiya xwe, bi siruşta ziravkê, bi gul û çîçek, dar û ber, av, teyr û tilûrên wê re, bi şahî – weke tabloyek rengîn ku, bi destê hunermendekî navdayî cêbûye – bû yek.

Desteya weşana Newrozê hemî xwendekar û hunermendên di wê seyran û şahiyê de beşdar û alîkar bûne. Sipas dike û serkeftinê ji wan re dixwaze.

- **Komcivînên hevpişk**:

Di çarçewa têkliyên rêxistina P.Y.D.Ks , li zanîngeha Helebê de, bi partiyên bira re , rêxistina P.Y. D .Ks li zanîngehê û rêxistina P.D.Ks (A di Hevbend e) , çend komcivînên hevpişk ji xwendekarên zanîngehê re, bi rêk û pêk li dar xistin. Ew komcivîn . li ba beşdaran , ciyê sûd û rêzgirtinê bûn.

Rêxistina Reqê- Kobanî- Girêsipşî

Rêxistina P.Y.D.Ks , li Reqê û Kobaniyê , di 21.4 2006an de , ji bo cejna rojnemevaniya Kurd , li kela Cehberê , ahengek xweş çêkir . Koma Buhar ya Kobaniyê , Reqê û Tilebyedê , bi stiran û reqs û semayên xwe ew şahiya xemilandin . Lê beşdaran jî bi beşdariya xwe , kela şênkirin . di şahiyê de , wêneyên Mîr Mîqda Midhet Bedirxan jî belav bûn , û gotina patiya me û ya Komelê jî hate xwendin .

*** Konfirasa zimanê Kurdî** :

- Zimanhezên zimanê Kurd , li bajarê Helebê û bi beşdariya hin Nûnera ji herêma Cezîr û Efrînê , li 27 . 3 an , civatek fereh û zengîn bo parastin û fêrkirina zimanê dê , li dar xistin